
Wezareta Perwerdehiyê ya NSW

# Baştirîn Destpêkê a Nirxandina Baxçeyê Zarokan

## Rêberek ji bo dêûbav û lênêran

**Baştirîn Destpêkê a Nirxandina Baxçeyê Zarokan  nirxandinek li seranserê welatê ye ku ji mamosteyan re dibe alîkar ku di destpêka Baxçeyê Zarokan de behreyên bi Înglîzî xwendin û hejmartinê yên her xwendekarek nas bikin.**




Zarok bi jêhatîbûnên cûrbecûr xwende-nivîsendetiyê û hejmartinê, zanîn û têgihîştina ku ji pêwendiya bi cîhan û mirovên li dora xwe re peyda bûne dest bi dibistanê dikin. Baştirîn Destpêkê a Nirxandina Baxçeyê Zarokan  pêkhateyek xwendin û hejmartinê vedihewîne û li ser hêz û hewcedariyên takekesî yên xwendekaran agahdarî dide mamosteyan.

Nirxandin piştgirî dide mamosteyan ku bernameyên hînkirin û fêrbûnê pêşve bibin ku li ser tiştên ku xwendekar dizanin ava dibin. Mamoste bi her xwendekar re ferdî rûnin, li ser tiştên ku ew dikarin bikin balê dikişînin. Zarokê we ne hewce ye ku ji bo nirxandinê amade bike an bixwîne. Ji ber ku zarok bi rêjeyên cûda fêr dibin, ne hewce ye ku meriv bifikire heke zarokê we nikaribe bersiva hemî pirsan bide.

Demeke kin piştî nirxandinê, mamoste dê li ser jêhatîbûn, zanîn û têgihîştina zarokê we di dema nirxandinê de agahdarî bidin we.

Baştirîn Destpêkê a Nirxandina Baxçeyê Zarokan  di nav hemî xwendekaran de ye. Heke Îngilîzî ne zimanê weya malê ye an jî zaroka we pêdivî bi verastkirinê heye, ji bo bêtir agahdarî li ser ka zarokê we çawa dikare were piştgirî kirin bi dibistana xwe re têkilî daynin.

### Nirxandina xwendin û nivîsandinê

Karên xwende-nivîsendetiyê têne sêwirandin ku nas bikin ka xwendekar dikarin navê xwe binivîsin, deng, tîp û peyvên nas bikin, û zanyarîyên li ser pirtûkek kurt ku ji wan re hatî xwendin bi bîr bînin.

Di dema nirxandina xwendin û nivîsandinê de mamoste dê ji zarokê we pirsên wekî:

- 'Guh bide van peyvan: map, tap. Ma hûn dikarin peyvek din ku bi heman deng bbînin?'
- (piştî xwendina pirtûkek kurt) 'Tu dikarî ji min re çîroka ku min tenê ji te re xwend bibêjî çiye?'

Van pirsan ji mamosteyan re dibe alîkar ku diyar bikin ka zarokê we dikare peyvên ku yek deng in nas bike û agahdariya ji pirtûkek kurt a ku ji wan re hatî xwendin bi bîr bîne. Ev jêhatîbûnên xwende-nivîsendetiyê yên girîng in ku dê zarok di sala xwe ya yekem a dibistanê de pêş bixin.

### Nirxandina jimarebûnê

Karên jimartinê bi têgînên hejmarên destpêkê ve girêdayî ne û ji bo destnîşankirina ku xwendekarek dikare çiqas baş bijmêre, ew dikarin kîjan jimareyan nas bikin, ka ew dikarin tiştan bijmêrin, jimareyên piçûk zêde bikin an jê bikin hatine çêkirin; û qalibên dubare nas dikin.

Di dema nirxandina hejmartinê de mamoste dê ji zarokê we pirsên wekî:

- ji yekê dest bi jimartinê bike û ez ê ji te re bibêjim kengê bisekine'
- ‘tu dikarî ji min re bibêjî ev çend hejmar e?’ (5)

Ev pirs dê ji mamosteyan re bibin alîkar ku diyar bikin ka zarokê we dikare hejmaran nas bike û ji yekê û pê ve bijmêre. Ev jêhatîbûnên hejmartinê yên girîng in ku dê zarok di sala xweya yekem a dibistanê de pêş bixin.

**Ji bo bêtir agahdarî di derbarê Nirxandina Baxçeyê Zarokan a Baştirîn Destpêkê de, bi dibistana zarokê xwe re têkilî daynin.**

**Ger ji we re wergêrek lazim be, bi Servîsa Wergêra Têlefonê re li ser 131 450 re têkilî daynin. Ew dikarin wergêrek bi zimanê we saz bikin ku alîkariya axaftina bi dibistanê re bike. Hûn ê ji bo vê xizmetê dirav naden.**